

**Tu Çiyakî mezin,  
ji me re palpişt bû ey mamoste!**

Diljar Emîn

Helbestvan û zaniyarê Kurd **Seyid Eliyê Findikî** dibêje:

Di dinyayê heçî rabe feqîr  
û şêx û axa be

Ji ber mirinê xelas nabe di  
şerq û hem di xerbê de.

Rast e, lê belê mirina kesina mîna ku pelek ji darekê biweşe û ya hinan jî, mîna herifandina çiyar e.

Çûna mamoste **Bavê Şiyar** herifandina çiyayekî mezin e, ne li ser sînga zemînê bi tenê ye, lê belê ji ser sînga şovenîzmê ye jî, ji ber ku destlata zordest û kotek ji kesên ku zirt û fortan dikin û ye pesindana wî dikin û xwe li dora wî hildidin natirse, lê belê ew ji wan kesên li dora xwe, yên bê deng û bi hûrbînîn lê dinêrin ditirse.

Vêca mamoste **Bavê Şiyar** ji wan kesên xwedî nêrînên hişmend bû, bi zaniyarî li rewşa civaka sûriyê bi tevayî û ya Kurd bi taybetî, li kiryar û siyaseta destlatê dinêrî û dinirxand.

Ji ber vê yeka han jî, helwest û nêrînên partiya wî li cem her kesê xwedî bîr û bawerî, rewşenbîr, keseyetiyan welatparêz ên serbixwe û dezgeh û partiyên opozisyona demoqrasî ya Sûriyê cihê rêzgirtinê bûn. .

Ev yeka jî, di roja rêwresma veşartina wî de, ji me tevan re diyar bû.

Mamoste bi alîkariya hevalên xwe dikarîbû gelek nêrînên nû derbasî siyaseta û rêbaza partiya xwe bike û xwebateke bê westan di ber wan de bike, ta ku, cihê xwe di nav millet de girtin, yek ji wan : **Taybetmendiya pirsra kurdî li sûriyê, û giringiya xweseriya biriyara siyasî bû.** Ango, çareserkirina pirsra Kurd li Sûriyê li Şamê ye, nabe ku, tu kes berê milletê Kurd li Sûriyê bide parçeyên Kurdistanê yên dîtir, tevî pêdiviya, ku em hemî ji hev re palpişt û piştgir bin.

Ya din : **Têkilî û peywndiyên kurdistanî** li ser pînesîpa rêzgirtinê bin û biriyara tevgera her parçeyekî li gora merc û rewşa wê be, ne di bin bandor û akama tu partiyên din de be. Ev yeka han jî di şerê navbera PDK û YNK de hat xuyakirin, ku partiya nemir **Bavê Şiyar** dijî

birakujiyê bû, û rexê partiyekê dijî ya din negirt!

**Pişkdariya kesên serbixwe di biriyara siyasî de:** Ji ber ku siyaseta ne li ser navê partiyan bi tenê hatiye tapokirin. Ta ku em karibin siyaseta li civakê vegerînin, pêdivî ye ku hemî çîn û qatên civakê bi me re di biriyara siyasî de, hevpar bin. Evê jî, nemaze di ezmûna **Encûmena Giştî ya Hevbendiyê** de baş ciyê xwe girtiye.

**Pirsra Kurdî li Sûriyê parçeke ji pirsra demqrasiyê ye:** Çimkî, piştî peymanê saykîs – Bîko, çarenûsa gelê Kurd, bêyî vîna wî, bi ya Sûriyê ve hate girêdan, û gelê Kurd xwîn di ber xaka welatê xwe Sûriyê de rijandiye. Tevî ku destlatê bi hemî şeweyan hewl daye û hê jî dide ku vê rastiya han bincil û bînpê bike. Lê pirsra Kurdî, pirsra niştmanî û demoqrasiyê ye, pêdivî ye ku hemî welatiyên Sûriyê pê mijûl bibin, û piştgiriya wê bikin. Ji ber ku gelê Kurd jî xwedî û hevpişkê vî welatî ye, ne mîvane, wekî hin nezan û nêzbîn dibêjin.

**Platforma Danezana Şamê:** Partiya mamoste, yek ji hîmdarên Danazana Şamê bû, û mamoste, wek enadamekî çalak di serkirdayetiya wê de, xebateke bê hempa dikir, ta ku gihiştine avakirina Encûmena Niştimanî ya Danazana Şamê. Lê mixabin, piştî wê girtina remkî ya hovane ji endamên encûmena danezanê re, hinek sistî kete karê wê, lê mamoste bi her hawî xebat û bizav dikir ku wê bi ser hev de bide, karê wê careke din geş û gur bike. Lê sed mixabin, mirina reş rê neda ku ew armanc here serî û bi cih bibe.

Bê guman, xwediyê vê siyaseta, wê ciyê metirsiya destlata zordest be, û li hember pîlanên wê, çiyayekî mezin be.

Rast e, ew çiyak bû ji ser sînga şovenîzmê rabû, lê belê, bîr û baweriyên wî, dê bibin ristek ji çiyar li hember siyaseta û kiryarên wê û tîn germê bidin xebata niştimanî ya hevpişk li Sûriyê.

Cihê te buhişt be ey mamosteyê mezin.